# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :980 | 20-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165


# Xaniyên bedew roj bi roj hildiweşin!

Yek ji cih û warên ku herî zêde bala geştyaran li Bedlîsê dikişîne, xaniyên ji kevir û textan yên Hîzanê ne.

Yek ji cih û warên ku herî zêde bala geştyaran li Bedlîsê dikişîne, xaniyên ji kevir û textan yên Hîzanê ne. Dema wêneyên van xaniyan li ser medyayê tên parvekirin, gelek kes van wêneyan diecibîne û paşê jî diçin sim bi kevir û textan hatine çêkirin. Dema meriv li van xaniyan dinihêre, ew ruhê dîrokeke kevnar bi meriv didin hîşkirinê. Her sal gelek derhêner û wênegir tên van gundan û wêneyan digirin. Heta niha gelek film jî li van gundan hatine çêkirin. Nexasim jî di payîz û zivistanê de gelek kes diçin serdana van gundan û dîmenên xweşik yên xwezayî digirin.



serdana van gundan da ku xaniyan bibînin. Nexasim jî derhêner û wênegir xwe lê digirin. Lê ev gundên xweşik û xaniyên bi kevir niha li ber hilweşînê ne. Heger pêşî lê neyê girtin, roj bi roj wê rewşa van xaniyan xerabtir bibe û ew ê hilweşin.

Ev xaniyên du yan jî sê qatî li ser hev û girêdayî hev tên çêkirin. Li navçeya Hîzanê, du gund xwediyê vê mîmariyê ne. Gund di quntara çiyayan de hatine lêkirin û qederê 300 sal in ku ev xanî li ser piyan dimînin. Malên li van gundan nexa- Lê di van salên dawî de ev xaniyên kevn yên bedew hatine ber hilweşînê. Gundiyan piştgirî xwest ji hin saziyan da ku karibin van xaniyan biparêzin, lê kesî alîkarî neda wan. Ji lewma jî kevirên xaniyan roj bi roj dikevin. Dema gundî dixwazin bi derfetên xwe van xaniyan biparêzin, vê carê jî betonê bi kar tînin û beton xemla xaniyan xera dike. Heger pêşî li vê yekê neyê girtin, bi demê re dê ti bedewiya van xaniyan nemîne û kes nikaribe dîmenên xweşik ên van gundan û xaniyan jî bigire.
JINNEWS

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Arîşe | Alozî, pirsgirêk, kêşe, gelemşe, mûşkîle, problem... |
| Aşît/aşût | Şapeya berfê |
| Format (Ingilîzî) | Awa, şekil, reng, şêwe: Pirtûk bi formateke nû çap kir. Bernameya xwe bi formateke cuda çêkir. |
| Form (Fransî) | Teşe, şêwaz, şekil, awa..: Helbestvan helbesta xwe bi formeke nû bi cî kir. |
| Forum (Latînî) | 1. Di dema Roma de qanên ku gel ji bo gotûbêjkirina pirsgirêkan lê kom dibû. 2. Gotûbêjên bi komî. 3. Qadên gotûbêjê: Ragihandin foruma civakan e. |
| Sekvan | Kesê di avêtina gule, yan tîran de jêhatî, kesê li nîşanê dixe. |
| Sekvanî | Karê kesê sekvan: Çalakiyeke sekvanî kir. |
| Şepal | Şêra mê. |
| Zirx | Hesin yan jî tişteke din ya qayîm, ku ji bo zerer negihe mirov yan tiştekî, yan gule û çekin din lê neçin, li wan tên pêçan. |
| Zirxî | Amûr, alav û tiştên bi zirxê hatîn pêçan: Li seyareyeke zirxî siwar bûn. |

# Ji sedî 94 karkerên malan ji ewleyiya civakî bêpar in

**Li gorî raporeke Rêxistina Kar ya Navneteweyî, di asta cîhanî de ji sedî 94 mirovên di karên malan de dixebitin ji ewleyiya civakî bêpar in.**

Di raporê de hate ragihandin ku karkerên malê ji aliyê pêwîstiyên lênihêrîn û şexsî ve tevkariyeke gelekî girîng li civakê dikin, lê belê tevî vê yekê jî mafên ewlehiya civakî yên 75.6 milyon karkerên mafê kêm e.

Ji sedî 76.2 ê karkerên malê (57.7 milyon kes) jin e. Li Ewropa û Asya Navîn ji sedî 57.3 ê karkerên malê ji aliyê qanûnî ve dikarin sûdê ji alîkariyan hemûyan werbigirin, lê belê li parzemîna Emerîkayê tenê ji sedî 10 ê karkerên malê dikarin sûdê ji van mafan werbigirin.

Li Dewletên Ereb, Asya, Pasîfî û Efrîkayê, ku di asteke bilind de karkerên malê têne xebitandin, kêm ji wan xwedî mafê ewlehiya civakî ne.

Di dewama raporê de hate ragihandin ku zêdeyî ji sedî 60 ê karkeran bi rengekî ne qeydkirî dixebitin.

Li gorî raporeke din jî ku ji aliyê Buroya Karên Xebatkaran a ser bi Rêxistina Kar a Navneteweyî ya Neteweyên Yekbûyî ve ye (ACTRAV) û di 7'ê Tîrmeha 2022'an de li Cenevreyê hate eşkerekirin, ji bo karkerên li qadên bejahî



dixebitin jî parastina civakî tenê xeyaleke.

Di raporê de ku li ser 16 lêkolînên li 15 welatên li Efrîka, Asya, Asya Navîn, Ewropa û Latîn Emerîkayê hate amadekirin, ji sedî 95 ê zarokên têne xebitandin li qada çandiniyê têne karkirin.
***ANF***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | S | E | D | ■ | Z | E | N | D | ■ |
| 2 | A | D | ■ | S | A | W | ■ | E | M |
| 3 | F | E | R | ■ | X | ■ | A | L | Î |
| 4 | ■ | N | A | T | O | R | ■ | T | ■ |
| 5 | X | E | ■ | Û | ■ | E | B | A | D |
| 6 | W | ■ | A | L | A | ■ | O | ■ | O |
| 7 | ■ | A | ■ | E | L | E | Z | Î | Z |
| 8 | S | P | Î | ■ | A | Y | ■ | S | Î |
| 9 | B | ■ | N | A | L | ■ | N | A | N |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | | | | | |
| 4 | | ■ | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 5 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 6 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 8 | ■ | | | | ■ | | | | ■ |
| 9 | | | | ■ | | ■ | | | |

### ÇEP-RAST

1. Kesê ku li ber aş dimîne û karê hêrandina aşî dike
2. Navçeyeke Amedê... Tevgera hewayê
3. Agir... Berhema ku demeke dûvdirêj di ser re derbas dibe, tiştek ji qîmeta xwe winda nake
4. Plakaya navneteweyî ya Tirkiyeyê
5. Kîjan çem li nav Amedê derbas dibe... Baneşana bêhntengiyê
6. Awayekî danse, babetek ji şanoya muzîkal... Li hin herêman di wateya 'tu' de tê bikaranîn
7. Rojek... Daçekek... (Rustemê ...) Destaneke me
8. Dijbera girînê... Birîn, keser
9. Firaqa ji gil... Xwarina serek

### JOR-JÊR

1. Bajarekî me... Jin an jî mêrê ku hevsera/ê wî/wê miriye
2. Plakaya navneteweyî ya Îranê... Zimanê gelê Danîmarkayê
3. Kurteya elementa Aktînyûmê... Êsîr... Cînavaka kesê yekemîn a yekjimar
4. Li Colemêrgê gotina 'yek'ê... Eyd
5. Bêzar û bêziman
6. Qumaşê ku ji hiriyê çêdibe... Di zimanê zarokan de lêxistin
7. Dijbera çepê... (Mehmet ...) Nivîskarê berhema 'Bîra Qederê' û gelek romanên din
8. Roja em tê de ne... Beyreq, sembola welatan
9. Beranê 1-2 salî... Remil

# KCK: Li dijî dagîrkeriyê parastina Şoreşa Rojava erkê her kesî ye

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê diyar kir ku Şoreşa Rojava, şoreşa hevpar ya tevayiya gelan e û got, li dijî dagîrkeriyê parastina vê şoreşê erkê her kesî ye. ***R-3***



# Foza Yûsiv: Hêza me heye, em pişta xwe bi hêzên garantor xurt nakin



Endama Desteya Serokatiya PYD`ê: Divê em ji dîrokê fêr bibin û waneyan derxin û xwe nexapînin; Rûsya û Amerîka ji bo berjewendiyên xwe li vir in û emê xwe nespêrin wan. Hêza me, hêza hevgirtin û xweparastina gelên herêmê ye. ***R-5***


# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 980 | 20-Tîrmeh- 2022 | www.ronahi.net/ku/


# ŞOREŞA ROJAVA RÛMETA MIROVAYIYÊ PARAST

Şoreşa Rojava salvegera xwe ya 10. pîroz dike. Deh sal bi şer, serûbinbûn, dorpêç û tevgerên dagîrkeriyê derbas bûn. Şer û şoreş di nava hev de dewam dikin. Şoreşa Rojava bi geşedanên li Rojhilata Navî re derket holê. ***R-5***



# Fermandareke xurt, bi biryar û wêrek bû

Heval Gulbahar ji Botanê bû. Xwedî li kevneşopiya berxwedêriyê ya herêma xwe derket. Kenê xwe ji hevrêyên xwe re hişt û tevlî nava karwanê nemiran bû.

Vegotina rastiya hevala Gulbahar (Zozan Şalci) ji bo min gelekî zehmet e. Ji ber ku hevala Gulbahar bi bedewî û hevrêtiya xwe cihê xwe di dilê me de girtibû. Gava ku min hevala Gulbahar nas kir, min dît ku fedakar e, di nava jiyanê de pêşeng e, bi hevrêtî û armancên xwe miroveke nêzî rasteqîniyê ye.

Min hevala Gulbahar li Akademiya Hakî Karer nas kir. Di pêvajoya herî zehmet de ji min re bû alîkar. Hevala Gulbahar milîtaneke gelekî çalak bû û ji bo hevalên xwe her tim ked dida. Dema ku qala coş û moralê tê kirin timî hevala Gulbahar tê bîra min. Jiyaneke pak û bi pîvan ji xwe re dikir esas. Jineke wêrek, xurt û bi biryar bû. Min gelekî sûd ji hevrêtiya wê wergirt, kenê wê yê ji dil wê ti carî ji bîra min neçe.

Li Akademiyê tevî Gulbahar em di karên ewlekariyê de bûn. Bi coş û moraleke mezin tevlî kar dibû. Hevala Gulbahar ku di temenekî ciwan de tevlî nava partiyê bû, ji aliyê pratîkî ve mîna ku xwedî tecrûbeya bi hezaran salî bû. Hevala Gulbahar li Zapê di nava şert û mercên herî giran de têkoşiya. Hawankareke pispor bû. Li Zapê bi pêşengî tevlî gelek çalakiyan bû. Derbên giran li dijmin xist.

Hevala Gulbahar di şer û jiyanê de fermandareke xwezayî bû. Di karakterê wê de tiştekî ku nikare bê kirin tune bû. Her tim digot, ‘Em ê dijminê qirker li Kurdistanê tune bikin’. Bi vê hêrsê li dijî dijmin şer kir. Timî dixwest biçe Botanê. Bi eşqa Botanê dijiya. Rêwîtiya hevala Gulbahar timî di nava şert û mercên giran û qadên zehmet de bû. Alîkarî dida hemû hevalan. Rola xwe ya pêşengiyê timî bi cih anî. Rojekê bi tenê jî bêmoral nebû. Bi coşa xwe her kes dikenand.



Hevala Gulbahar li herêma berxwedanê li Botanê bû. Xwedî li kevneşopiya berxwedêriyê ya herêma lê ji dayik bû derket. Kenê xwe ji hevrêyên xwe re hişt û tevlî nava karwanê nemiran bû. Bi şehadeta xwe re li çiyayên Kurdistanê wê bibe bi hezaran Gulbahar Çirav.

Bila dilê te xweş be hevrêya min, em ê ala berxwedanê bi azadiya Rêber Apo û Kurdistanê tacîdar bikin. Oxir be ji te re heval, tu yê her tim di dilê gelê xwe de be.

***ANF-Deniz Garzan***

# Bandorên zewicandina di temenê piçûk de

**Yek ji wan diyardeyên ji dema kevin ve di nava civakê de bûye zincîra tundûtujiya bi awayê sîstematîk û li ser jinan dimeşe, zewicandina ti temenê piçûk de ye.**



Zewicandina di temenê piçûk, pêşwext, zewicandina ji dervey dadgeh û yasayê, hinek caran bi zorê zewicandina zarokan, weke sedemek sereke ya pirsgirêkên civakî tê dîtin.

Zewicîn proseyek ji bo bingeh danîn û avakirina jiyanek nû, lê zewaca di temenê biçûk de ji bilî binpêkirina mafê jinan û hinek caran yê zilaman jî, bi xwe re gelek bandorên nerênî tîne. Li gorî danezana mafê mirovan ya Neteweyên Yekbûyî zewaca di temenê biçûk de bi hemû awayî, weke tundûtujî û binpêkirina mafê zarokan tê hesibandin. Herwiha danezana navnetewî ya mafê mirovan, zewaca dibin temenê 18 salî de qedexe kiriye û li gorî yasayê li gelek welatan zewaca di temenê biçûk de weke tundûtujî û destdirêjiya ser zarokan tê binavkirin.

Lê bi taybet li Rojhilata Navî di nav de jî li Kurdistanê, zewaca pêşwext di astek pêş deye, di asta cîhanê de jî salane 14 milyon jin di temenê 14 heya 19 salî de dibin dayîk. Herwiha dayîkên temen 15 salî di dema ducaniyê de dibin qurbanî yan jî jiyana xwe ji dest didin.
Tevî li Kurdistanê bi rêya rêxistinên parastina mafê zarokan, derbarê zewaca di temenê biçûk de civak tê hişyarkirin jî, lê livir zarokên keç ên di temenê biçûk de di zewicin. Li Herêma Kurdistanê piştî derketina yasaya hejmara 15 ya sala 2008’an karkirina bi yasaya kesî ya Iraqê hate rawestandin û temenê yasayî yê ji bo zewaca keçan bû 16. Li li gorî daneyên dawî derdikeve holê ku rêjeya zewaca di temenê biçûk de li Herêma Kurdistanê sal bi zal bilind dibe. Di 1’ê Tîrmehê de Desteya Daneyên Herêma Kurdistanê bi raporekê encamên teduristî û civakî li Herêma Kurdistan yên sala 2021’an eşkere kir. Li gorî raporê ji sedî 15’ê zarokên keç di temenê beriya 15 saliyê de dizewicin.
Herwiha li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî ya ku di 9’ê Hezîranê de hatî belavkirin, di sala 2021’an de li Iraqê zewaca di temenê biçûk de gihiştiye sedî 25.5 û li Herêma Kurdistanê jî gihiştiye sedî 22.6.

**Sedemên zewicandina di temenê piçûk de çine?**

Em dikarin gelek sedemên weke çandî, aborî, olî û nebûna hişyariya kes di van çend xalên jêr de diyar bikin.
Sedema çandî: Di hinek civakan de ji wan ya Kurdan, zewaca di temenê biçûk de weke ku baş û girînge tê dîtin. Zarok wisan perwerde dikin ku zewicîn ji xwendin û karkirinê girîngtire.
Sedema takekesî: Hinek kesên ku cara yekem dibin hevalê hev, bê ku pêşeroj û berpirsyartiya jiyanê bînin bîra xwe, biryara zewicînê didin.
Sedema aborî: Zexta aborî ya ku taybet di wê malbata ku hejar û zarokên wan pirin de, dibe sedem ku dayîk û bav tenê zewicandina zarokên xwe bifikire. Gelek ji van malbatan zarokên xwe didin kesên ku aboriya wan başe, tevî bi temen jî bin lê carek din zarokên xwe bi wan re didin zewicandin.

**Derencama zewicandina di temenê biçûk de**

Derencama vê yekê aliyek xwe civakî û aliyek din jî bedeniye. Derencama civakî ya zewaca pêşwext, li dadgehê qeydnekirina hevsergiriyê, hevberdan. Li gorî daneyan ji sedî 50 hev berdanan di navbera temenê 15-30 salî de pêktên. Herwiha derencamek din ya zewaca temenê biçûk, tundûtujiya dijî jinan, tundûtujiya malbat, reva ji mal, dev ji xwendinê berdan û zêdebûna rêjeya nexwendinê. Xwe şewitandin û kuştin û bilindbûna rêjeya hejariya di nava civakê de.

**Bandora tenduristiyê**

Li gorî dixtoran zewaca di temenê biçûk de bandorek xwe ya nerênî heye, bi taybet jinên ciwan di warê beden û biyolojî de ne amadene bibin dayîk. Gelek caran dibin sedem ku jiyana xwe ji dest bidin.

**Aliyê derûnî**

Di van cûrên zewacê de zarok ji zaroktiya xwe durdikevin û peywendiya bi malbat û hevaltiyê re qut dibe. Li aliyek din berpirsyartiya jiyanek nû dikeve ser û çalakiyên wê jî her di çarçoveya mal û zarokan de asteng dibe û ev jî dibe sedema nîşana serhildana diltengiyê.

**Zêdebûna tundûtujiya malbatê ya li dijî jinan**

Zarokên keç ên di temenê biçûk de dizewicin, zêdetirî xwe di kevin bin tundûtujiya malbat û destdirêjiya zayendî ya malbtê de. Bi awayek ku nebûna perwerde, tevlînebûn û biryardana di karûbaran de dibin sedemê gelek tundûtujiyan û ev tundûtujî heya dawiya jiyana wan dewam dike. Ev zarokanên di zewicin ji ber ferqa temen kêmtir dikarin guftugoyê bikin û li ser mijarên civakê biryarê bidin.

**Ji mafê xwendinê bêparbûn**

Xwendin û perwerde, rolek girîng di pêşketin û asta hişyariyê de dike. Li gorî lêkolînan dayîkên di temenê biçûk de hatine zewicandin, girîngiyê didin xwendinê û dixwazin zarokên wan bixwînin.

**Çareseriya diyardeya zewaca di temenê biçûk de çine?**

Civaknas derbarê diyardeya zewaca di temenê biçûk de dibêjin; “Pêwîste hemû rêxistinên civaka sivîl, aliyên peywendîdar, navendên perwerde û akademî rê li van diyardeyan bigrin. Bi lidarxistina çalakiyên rewşenbîrî û hişyariyê, agahiyên tendurist, civakî û derûnî, xelk dikare hişyar bibin. Bi taybet ji bo vê yekê erkek mezin dikeve ser milê dayîk û bavan,

***ROJNEWS***



# Destarê Dibistana Şano ya Zarokan digere û perwerdeya xwe bi pêşkêşkirina şano diqedîne

Bi şanoya Xwendin Jiyan e Dibistana Zarokan Ya şanoyê perwerdeya xwe ya duduyan bi serkeftî qedand. Wê çalakiyên xwe jî bidomîne û şanoyê li bajarên bakur û rojhilatê Sûriyê bigerîne.

**Xalid Etê/Qamişlo**

Perwerdeya duduyan ya sê Mehan qediya
Dibistana Zarokan Ya Şanoyê ya ji aliyê Desteya Çand û Hunerê ya herêma Cizîrê ve meha 10`an ya sala 2021`ê hatî vekirin, 17ê Tîrmehê bi çalakî û pêşkêşkirina şanoya `Xwendin Jiyan e` li navenda Mihemed Şêxo ya Çand û Hunerê, xola duduyan ya perwerdeyê qedand. Çalakiya dibistanê 16 û 17`ê Tîrmehê dewam kir û bi jimareke mezin ya heskeriyên şanoyê, şano hat pêşkêşkirin û perwerdeya ku sê mehan dewma kir bi belavkirina bawernameyan li 13 zarokan bi dawî bû.

**`Perwerdeyeke serkeftî û şanoyeke bipeyam `**



Têkildarî mijarê Derhêner û nivîkarê şanoya `Xwendin Jiyan e` Ebdulcabir Hebîb ku yek ji endmêm ekîba perwerdeya dibistanê ye ji me re ev nirxandin kir: “Ev perwede pir serkeftî bû, jimara zarokên hatîn perwerdekirin 13 bû. Me endamên perwerdeya kevin jî tevl kirbûn. Ev bi armanca ku hem zarok ji kesê ji xwe mezintir û hem jî biezmûntir fêr bibin hat kirin. Qedandina perwerdeyê bi şanoya bi navê `Xwerndin Jiyan e` bi dawî bû. Me şanoyeke bi vê naverokê pêwîst dît. Lewra di nava van deh salan de ji ber şer, xizanî û aloziyê, zarokan dev ji dibistanên xwe berda û dest bi kar kirin û paşreojeke nediyar ji wan re derket. Şano û dibistana me peyameke wê hebû ji civakê re. Peyama jî ew e ku çi bi ser malbatan bê divê zarok ji dibistanê dernekeve, lewra wê encama wê li zarokê xambaxtir be.”



**Hûrgiliyên perwerdeyê û xebata dibistanê**

Li gorî planên dibistanê, her perwerde sê mehan didome. Perwerdeya yekê jimara zarokan 20 bû. Ya duduyan 13 bû. Perwerde, ji aliyê komîteya perwerdeyê nivîskar Ebdulmecîd Xelef, Derhêner û nivîkar Ebdulcabir Hebîb û dîkorsaz Ciwan Silo ve tê birêvebirin.
Li gorî rêveberiya dibistanê, ji bilî perwerdeya şano zarok fêrî nivîsa çirok û helbestan û perwerdeya fikirî û kesayetî jî dibin. Her sal wê nêzî 150 zarokî perwerde bibin. Di dawiya her perwerdeyê de wê zarok du şanoyan pêşkêş bikin û her sê xol jî wê bi hev re çar şanoyan pêşkêş bikin û mihrîcaneke taybet jib o zarokan li dar bixin. Di projeyên dibistanê de jî heye ku şanoya zarokan li kolanê pêşkêş bikin û film û skêçan amede bikin. Di dema pêş de ev zarok wê li derveyî bajarê Qamişlo jî li Rimêlan, Hesekû û Reqayê bi ziamnê erebî û kurdî çalakiyên şanoyê li dar bixin.

# Dîwana Wêjeyê: Emê komxebateke taybet ji bo wêjeya jinan bi rêxistin bikin

**Berdevka Dîwana Wêjeyê derbarê encamnameya ‘Hefteya Wêjeyê’ de got “Di demên pêş de li gorî rewşa herêmê emê komxebateke taybet ji bo wêjeya jinan bi rêxistin bikin.”**

Îsal cara yekemîn Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê rêzeçalakiyên `Hefteya Wêjeyî` li dar xist.

Piştî bidawîkirina çalakiyan encamnameyeke hat eşkerekirin. Têkildarî wê berdevka Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Narîman Evdikê ji me re axivî.



Narîman Evdikê da xuyakirin ku wan dixwest tevlêbûna rewşenbîr, nivîskar, helbestvan û wêjevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêdetir bûya, lê xwesteka wan bi cih nehat û got: “Encamên Hefteya Wêjeyî kar û xebatê Dîwana Wêjeyê ya salan diyar dike. Ji ber vê yekê me pêwîstî bi tevlêbûneke geştir didît. Tişta em dizanin sedema wê jî ji ber rêzeçalakiyeke nû bû. Em hêvî dikin ku di salên bê de geştir be.”

Narîman wiha pê de çû: “Em gihaştin asta ku em dikarin xalên sereke bidin ber hev. Ji bo pêşxistina wêjeya jinan em ê di demên pêş de komxebatekê li ser çend rojan organîze bikin, dê jinên ku nû dest bi nivîsê kirine jî tev li komxebatê bibin, em ê li ser encamê ku ji komxebatê derkevin jî bixebitin. Dibe ku em di vê salê de mîna vê komxebatê 2 caran li dar bixin.”




Li ser beşa rexneya wêjeyê jî Narîman got: “Em ê salonekê (dîwan), di wê salonê de wê rexneya berhemên wêjeyî ya herêmî bê girtin, dê tê de her 15 rojan carekê berhemek bê diyarkirin û dê endamên dîwanê wê berhemê bixwînin û binirxînin. Ev dîwan dê li Kobanê jî hebe.”

Narîman Evdikê da zanîn ku dibe ku encamên ji dîwana rexneya wêjeyê derkevin, bikin gotar û got: “Ew gotar jî dibe ku em bikin rêzegotar û piştre bikin pirtûk. Mixabin ji ber êriş û gefên dewleta Tirk gelek kar û xebat tên sekinandin, ji ber wê jî rewşa pêkanîna projeyan jî nayê nasîn.”

***ANHA***



## Bîranîn

Sîpan Şînda

Gelo mirov ji çi pêk tê? Çi tişt mirovî dike “mirov”? Ma hema mirov ji kelaş û giyanekê pêk tê? Nexêr, mirov ne ji kelaş û giyanî tenê pêk tê. Ew tiştekî ji wê wêdetir e. Ew tiştekî ji kelaş û giyanî pitir û mezintir e. Kelaşê mirovî hebûna mirovî ya girber dide nîşankirin û giyan jî ya razber dide nîşan. Lêbelê kesayet, girêdan, ra, hest, bîranîn, hişmendî, binhişî, rabirdû, xeyal, hêvî û gelek tiştên din mirovî dikin “mirov”. Ka werin em hinekê bi hev re behsa bîranînên xwe bikin.

Bîranîn xalekeke girîng ya rabirdûya mirovan e. Ew arşîva mirovî ya takekesî ye. Ne tenê tiştên erênî, herwiha tiştên neyînî jê di wê arşîvê de ne. Kesê ku bê bîranîn be di heman demê de ew bêarşîv e û herwiha bêdîrok e jî. Her çendî nehatiye binavkirin jî lêbelê her mirov dîrokeke takekesî heye. Ew ji bîranên mirovî ne. Dema mirov bixwaze tiştên ku mirov jiyayîn bîne bîra xwe û wan kêliyên xweş û nexweş dîsa bijî mirov arşîva xwe ya bîranînan vedike û rûpelên wê tevilhev dike. Di wê arşîva mirovî de çi hebe ew tên pêşiya mirovî û mirov li ser wan difikire. Gelek caran kêliyên nexweş jî derdikevin pêşiya mirovî û mirov pê xemgîn dibe. Lêbelê mirov nikare ji ber wê rastiyê bireve. Divê mirov ji wê nereve jî. Lewra ew her kêliyek, perçek yê jiyana mirovî ne. Tevî xweşî û nexweşiyan divê mirov wan bîranînan qebûl bike. Ez bawer dikim ji wan kêliyan yên herî xweş bîranînên zarokatiya mirovî ne. Dema mirov di zarokatiya xwe de bi hevalên xwe re, bi xwih û birayên xwe re lîstokên xweş lîstibe, mirov di tiştekê de serkeftî bûbe, yan mirov cih û warê xwe guhertibe, mirov şer kiribe, qebahetek kiribe ew hemû ji bîranînên mirovî yên ku mirov ti carî ji bîr nake ne. Her kengê mirov arşîva xwe veke û wan li bîra xwe bîne mirov jinûve diçe wan rojan û wan kêliyan dîsa dijî.

Bîranîneke din ya hem xweş hem ji mirovî xemgîn dike bîranînên evîndariya mirovî ne. Dema mirov evîndar dibe, her tişt li ber dilê mirovî, li ber çavên mirovî cuda ye. Nêrînên mirovî yên jiyanê ji li gorî evîndariya mirovî tên guhertin. Evîna mirovî tişta herî biqedr e li ber dilê mirovî. Kaniya jiyanê evîna mirovî ye û jiyan ber û wî/ê diherike. Piştî sal ser re derbas dibin û mirov wan rojan li bîra xwe tîne, mirov careke din wan kêliyan dijî, dilê mirovî geş dibe. Dema mirov di wan riyên ku mirov û bi evîna xwe re tê re çûyî, cihên ku mirov lê rûniştî dibîne ew kêliyên xweş hemû li ber çavên mirovî re derbas dibin. Mirov ji nişka ve dikeve nava hizran û wê gava ku mirov tê de ye ji bîr dike. Herwiha bîranînên nexweş jî mirovî tarûmar dikin. Jixwe bîranînên me Kurdan pirê wan nxweş, êş û elem in, kul û derd in. Ji ber wê ew hemû di binhişiya me de weke qumberekê disekinin û amade ne ku her gav biteqin.

Belê bîranînên me qetek ji keseyata me ne û emê heta kêliya dawî jî bi wan re bijîn.

# Projeya ziftkirina rê û kolanên bajarê Qamişlo didome

Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo projeya xwe ya ziftkirina rê û kolanên bajêr didomîne. Derbarê mijarê de endamê beşa lêkolînê ya Şaredariya Qamişlo Hesen Hisên da zanîn ku heta niha 25% ji projeya ziftê pêk anîne.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Şaredariya Gel ya Qamişlo, tevî zehmetî û êrişên dagîrkeriyê, li gorî plansaziya demsala havînê kar xebata xwe didomîne. Yek ji kar û projeyên wê yên herî girîng ku niha li ser dixebite, projeya ziftkirina rê û kolanan e. Çimkî gelek rê û kolanên bajarê Qamişlo ji ber kortik û koncalan xirabe ne. Ji bo wê şaredariyê 1`ê Hezîranê dest bi ziftkirina gelek kolanên bajêr kir. Şaredariyê ji kolanên taxa Hilêliyê dest pê kir û heta niha li gelek taxên bajêr berdewam e. Herwiha li rex xebatên ziftkirinê, projeya xwe ya serf sihî û hemleyên paqijiyê jî didomîne.



Têkildarî projeya ziftkirina rê û kolanên bajarê Qamişlo, herwiha domandina vê xebatê li gelek kolanên bajêr, endamê beşa lêkolînê ya şaredariya gel ya bajarê Qamişlo û welatiyên bajêr ji me re axivîn û nêrînên xwe anîn ziman.

### `Pêwîstî li kû hebe emê pêk bînin`

Hesen Hisên diyar kir ku li gorî daxwaziyên gel û komînan projeya ziftê pêk tînin û axaftina xwe wiha domand: “Me



ji sedî 25 ji projeyê pêk aniye. Di 1`ê Hezîranê de me dest bi projeyê kir. Destpêkê me cihên şkestî sererast kirin. Piştî sereastkirinê, me 11 Hezîranê dest bi ziftkirina kolanan kir. Li gorî pêwîstiya gel û şopandina me em kolanan zift dikin. Pêwîstî li kîjan kolanê hebe em pêk tînin. Me ji taxa Hilêliyê dest pê kir, pişt re em hatin taxa Xerbî me ew jî qedand. Niha em li taxa Kornêş dixebitin. Herwiha wê xebata me bidome, heta ku em projeyê bi dawî bikin û kolanên bajêr tevan sererast bikin.”

### Ya girîng alîkariya gel e

Hesen behsa zehmetiyan kir û wiha got: “Em rastî hin zehmetiyan tên. Ya herî zehmet ew e ku piştî em kolanê zift dikin gel ji bo pêwîstiya xwe, yan jî ji bo xebatên serfa sihî erdê dikolin û wê ziftê xirab dikin. Jixwe xebata me ji bo gel e. Em hêvîdar in gel jî bi me re alîkar be. Çimkî dema gel bi me re dibe alîkar em zehmetiyan li pêşiya xwe nabînin.”

`Armanc pêşxistina xizmetgûzariyê ye`
Hesen diyar kir ku armanca wan pêşxistina xizmetgûzariyê li herêmê ye. Herwiha got, du werşeyên me hene yek jê kolanên nava bajêr sererast dike, ya din jî li ser riyên sereke dixebite.

### `Siyaset û dagîrkerî nikarin pêşiya me bigirin`

Endamê beşa lêkolînê ya şaredariya gel ya bajarê Qamişlo Hesen Hisên di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser gef û êrişên dagîrkeriya tirjş û wiha axivî: “Tevî gef û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker, xebatên me berdewam in. Bi vê yekê em ji cîhanê û dagîrkeriyê re isbat dikin ku em dikarin li dijî êrişan xebatên xwe berdewam bikin û xizmeta gelê xwe bikin. Siyaset û dagîrkerî nikarin pêşiya me bigirin.”



Welatiyê bi navê Cabir Ehmed yê ji taxa Xerberî spasiya şaredariyê li ser kar û xebata wê kir û got, berî ku şaredarî dest bi sererastkirina kolanên taxê bike, me gelek zehmetî dikişand bi taybetî di dema zivistanê de ji ber av û gemar tev di koncalan de kom dibû. Lê piştî ku şaredariyê kolan sererast kirin û zift kirin prisgirêka me hat çareserkirin. Em bi hêvî ne ku projeyên wisa li tevayiya herêmê pêş bikevin.

### `Parastina paqijiyê û xweşikbûna bajêr erkê me ye`

Cabir di dawiyê de got, parastina xweşikbûna bajêr ne erkê şaredariyê tenê ye, erkê tevayiya welatiyan e. Ji bo wê erkê me ye ku em parastina paqijiya bajarê xwe bikin û destekê bidin şaredariya xwe.

# Daîreya Avê ya Dêrikê torên avê nû dike û bîrên nû dikole

**Daîreya Avê ya Şaredariya Gel ya Dêrikê gelek proje ji bo çareserkirina qutbûna avê pêk anîn. Tê payîn ku projeyên din jî pêk bîne ku yek ji wan sererastkirina torên sereke û kolanna bîran e.**

Daîreya Avê ya Şaredariya Gel ya Dêrikê bi hevkariya Desteya Enerjiyê ya Herêma Cizîrê, 3 bîrên ava vexwarinê bi xeta kehrebeya Nexweşxaneya Nîştimanî ve girêdan, ew jî ev in; bîra Merdûdo, bîra Mesakin û bîra Hevgirtina Cotkaran.




Ev bîr wê avê bi awayekî domdar derxin bê ku qutbûna kehrebeyê bandorê li wan bike.
Li gorî daîreyê ku ji bo çareserkirina pirsgirêka kêmbûna avê li Taxa Şehîd Xebat, bîreke din dê li taxê were kolandin.
Yek ji girîngtirîn projeyên Daîreya Avê di dema borî de, nûkirina torên avê yên taxên Dêrikê bû, ji ber ku piraniya wan xetan kevn û rizyayî bibûn.
Hevserokê Daîreya Avê ya Dêrikê Mistefa Ehmed destnîşan kir ku armanca wan ji wê projeyê ew bû ku bîran bi xeta kehrebeya nexweşxaneyê ve werin girêdan, ji bo qutbûna kehrebeyê bandorê li derxistina avê neke.
Mistefa Ehmed wiha lê zêde kir: “Bîr li hersê deverên Merdûdo, Mesakin û Hevgirtina Cotkaran in û ev proje bi hevkariya Desteya Enerjiyê ya herêma Cizîrê û Daîreya Çavkaniyên Avî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ku komîteyên Daîreya Kehrebeyê yên Dêrik û Til Koçer û Daîreya Avê ya Dêrikê rêveberiya wê dikin, pêk hat.”
Ehmed wiha domand: “Proje ji bo derxistina ava vexwarinê û dagirtina torên sereke û şaxî. Bi taybet li ku bîr lê hene. Lêçûna



projeyê jî nêzî 25 hezar dolar bû. Proje dê krîza avê li hemû taxên Dêrikê çareser bike.”
Tê payîn ku hemû torên taxên Dêrikê jî werin sererastkirin da ku kêmbûna avê li navçeyê bê çareserkirin.
*ANHA*

## Girîngiya Şoreşa Rojava!



**Ahmet AKTAŞ**

Em niha 10 saliya Şoreşa Rojava ya 19ê Tîrmeha 2012an pîroz dikin. Li ser xêrê be û li me tevayiya Kurdistaniyan û gelên bindest pîroz be!
Bi navê Şoreşa Rojava, lê ya rasttir divê em bêjin “pêngava yekê ya bi giştî Şoreşa Kurdistanê, ya damezirandina pergaleke nûjen û hemdem bi navê Rêveberiya Xweseriya Demokratî pîroz dikin”.
Lewra cara yekê ye ku di dîroka Kurdistanê de, bi bîrdoziyeke hemdem; bi felsefeyeke ku jiyana azad, demokratîk û wekhev ji bo tevayiya civakê di nava xwe de dihewîne pêk hat. Ev jî felsefeya Rêber APO ye.
Erê şert û mercên wê serdemê yên cîhanê û hêrêmê jî zêmîn dida, lê yê ku ev zemîn ji bo gelê Kurdistanê berxweş kir, rê nîşan da, li gel ku di zîndanê de, di nava dorpêç û tecrîdeke giran de bû jî, Rêber APO, bi giştî Tevgera Azadiyê, belê bi taybeti gelê Rojava û Tevgera wê hişyar kir. Bi vê tenê jî ranewestiya ewqas bi hûrgilî rê li ber rohnî dikir, hema weke Rêberekî fermana meşê bi ser wan de disepand!
Ka, bi kurtayî be jî, em hinekî bala xwe bidin konjoktora wê serdemê ya cîhanê û bi taybetî ya Herêma Rojhilata Navî.
Kes nemaye ku `Bihara Ereban` nebihîstiye.
Çalakiya yekê li Tûnûsê 17.12.2010. dest pê kir; bi navê Mihemed Buazîz kesekî xwe şewitand.
Li pey vê çalakiya li dijî birçîtî, bêexlaqiya civakî-siyasî, qedexeyên li ser ramanên azad, dizî û şert û mercên xerab yên jiyanê, bandora xwe li gelek welatên din jî kir û bayê wê derbasî Misir, Yemen, Sudan, Cezayir, Urdunê û hwd. bû. Herwiha, derbasî Iraq û Sûriyê jî bû, ku ev welatan yekser têkildarî şoreşa gelê Kurdistanê ne.
Ya girîng ew e ku bi navê lê hatiye kirin, ji vê “Bihara Ereban” kîjan gelî çi sûd girt?
Bêguman gelê herî xurt xwedanê Rêberî û rêxistin û serpêhatiyên şoreşgerî; gelê Kurdistanê bû. Lewma di vê demê de, rûmet û heybeta Şoreşa Rojava ya 19ê Tîrmeha 2012an derket pêş û ewqas dengê hêja û bibandor veda, hem di şoreşa giştî Kurdistanê de hem jî di raya giştî ya cîhanê de.
Jixwe, ma gelo êdî baştir nayê zanîn ka çima ew rêxistina terorîst ya di cîhanê de herî xwînrij û xwînxwar DAIŞê, êrîşa xwe ya sereke ajot ser Şoreşa Rojava?
Dema ku ketina DAIŞê bi çavê xwe dît, vê carê weke fermandarê yekê yê vê rêxistina terorîst R.Erdogan, yekser hêza dewleta xwe ya dagîrker ajot ser Şoreşa gelê Rojava. Bi piştgiriya Rûsya û DYA Efrîn, Serê Kaniyê û Grê spî dagîr kirin!
Çawa Şoreşa Rojava, ji bo gelên herêmê û tevayiya mirovayiyê bû weke pergaleke model ya pêşketî û hemdem, bi taybetî jî rola jinê ya pêşeng di şorêşê de, bala raya giştî ya cîhanê gelek bi xurtî kişand.
Helbet kevneperestiya cîhanê jî vala nesekinî, eşkere destek da hevalbendiya AKP û DAIŞê. Herwiha xiyaneta Kurdan, bi taybetî jî PDKa Erbîlê kişandin rex xwe û bi hev re êriş kirin ser Şoreşa Rojava!
Her niha jî, heman eniya kevneperest, ji ber wê tirsa xwe ya mezin ji Şoreşa Rojava, ku ji bo xwe alternatîf dibînin, di kesayeta vê Şoreşê de êrişî destkeftiyên Kurdistanî dikin.
Di encamê de, weke ku roja Çarşemê Fermandarê QSDê Mezlum Ebdê jî got, divê li dijî vê êrişa dagîrkerî û qirkirinê ya dewleta tirkî, gelê Kurdistanê û gelên Herêmê tev bikevin nava têkoşîneke hevpar. Lewra ev êriş, xeter e li ser deskeftiyên jiyana azad ya tevayiya gelên bindest.



# KCK: Li dijî dagîrkeriyê parastina Şoreşa Rojava erkê her kesî ye

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK’ê diyar kir ku Şoreşa Rojava, şoreşa hevpar ya tevayiya gelan e û got, li dijî dagîrkeriyê parastina vê şoreşê erkê her kesî ye.

**Navenda nûçeyan**

Hevseroktiya Konseya Rêveber ya KCK’ê derbarê salvegera 10`an ya Şoreşa Rojava de daxuyaniyeke nivîskî da. KCK’ê diyar kir ku salvegera 10`an ya Şoreşa Rojava ya 19’ê Tîrmehê şoreşa herî mezin û biwate ya sedsalê ye û got li dijî dagîrkeriyê parastina Şoreşa Rojava erkê her kesî ye.

### ‘Şoreşa Rojava nirx û dîrokeke girîng li şoreşên cîhanê zêde kir ’

KCK’ê, salevgera 10’an ya Şoreşa Rojava li tevayiya gelên Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, jin, ciwan û tevayiya gelên cîhanê pîroz kir û wiha got: “Şoreşa Rojava ya 19’ê Tîrmehê şoreşa mezin ya gelan û jinan e ku bi dirêjahiya dîrokê gelan li dijî desthilatdaran têkoşîna azadiyê dane û di sedsala 21’an de bi ser ketiye ye. Şoreşa Rojava ya 19’ê Tîrmehê ku berdewamiya şoreşên ku bindestan li dijî desthilatdaran pêk anîne ye, taybetmendiyên bêhempa afirand û nirxên gelekî girîng û dîrokî li şoreşên gelan ên cîhanê zêde kir.“

### ‘Bingehê şoreşê ji aliyê Rêber Apo ve hat danîn‘

KCK’ê da zanîn ku yek ji taybetmendiyên herî diyar ên Şoreşa 19’ê Tîrmehê eve ku îradeya hevpar û azad ya gelan esas digire û wiha dewam kir: “Şoreşa 19’ê Tîrmehê hişt ku pergala mêtingeriyê bi tevahî ji holê rabe û şoreş bigihêje xeyala jiyana wekhev û azad. Şoreşa 19’ê Tîrmehê bêyî ku serî li desthilatdarî û amûrên dewletê bide şoreş pêkanî û çareserî pêş xist. Bê guman afirînerê vê fikrê Rêber Apo ye. Rêber Apo bi zîhniyeta civaka polîtîk, exlaqî û sîstema Konfederalîzma Demokratîk ji pirsgirêka şoreşê re çareserî anî û li ser van esasan Şoreşa 19’ê Tîrmehê pêk hat. Ji ber wê Şoreşa 19’ê Tîrmehê bi xwe spartina fikir û paradîgmaya ku Rêber Apo danî holê pêk hatiye.”

KCK’ê daxuyakirin ku yek ji taybetmendiya herî girîng ya Şoreşa 19’ê Tîrmehê, ew e ku li ser bingeha zîhniyeta Neteweya Demokratîk hatiye avakirin û got: “Sîstema Neteweya Demokratîk ku li ser bingeha jiyana wekhev û hevpar ya gelan hatiye avakirin, hiştiye ku pevçûnên di navbera gelan, çand û civatên baweriyan ku bûye pirsgirêka herî girîng ya Rojhilata Navîn, bêyî ku şer bikin dikarin xwe bi xwe rêvebibin. Neteweperestî û sîstema netew-dewletê berovajî feraseta jiyana bi hev re û jiyana hevpar ku taybetmendiya herî diyar ya erdnîgariya Rojhilata Navî ye. Şoreşa 19’ê Tîrmehê ku li ser esasê zîhniyet û pergala Neteweya Demokratîk hatiye avakirin, ji bo vê pirsgirêka kûr a ku li Rojhilata Navîn bûye kangren çareserî anî û derfetê ku gelan li ser esasê wekheviyê bi hev re bijîn dabîn kir.“

### ‘Azadiya jinê esas girt‘

KCK’ê da zanîn ku Şoreşa 19’ê Tîrmehê jin û azadiya wê esas girtiye û wiha got: “Şoreşa 19’ê Tîrmehê di wateya rasteqîn de bûye şoreşa jinê. Pêkanîna şoreşa li ser bingehê azadiya jinê bi derbaskirina feraseta serdest a mêr ku di dîrokê de rê li ber mêtingerî û newekheviyê vekiriye û bi zêdekirina wê berdewam kiriye, di dîrokê de yekemîn e. Bê guman ked û rola jinê di her şoreşê de çêbûye. Lê belê Şoreşa 19’ê Tîrmehê şoreşeke bi pêşengiya jinê pêk hatiye û jin bi îrade bûye. Şoreşa ku xwe dispêre pêşengî û vîna jinê, pêşketineke gelekî girîng û dîrokî ye.”

KCK’ê destnîşan kir ku di vê pêvajoyê de li ser Şoreşa 19’ê Tîrmehê xeterên giran hene û wiha got: “Parastina şoreşê li hemberî êrîşên dagirkeriyê erk û berpirsyariya herî bingehîn ya şoreşgerî û welatparêziyê ye. Faşîzma AKP-MHP’ê ku xwedî zîhniyeta dij-Kurd a dewleta Tirk a qirker a mêtinger e, bi refleksa êrîş û tunekirina her tiştî li ser navê Kurdayetiyê tevdigere û dixwaze Şoreşa Rojava tasfiye bike. Dagîrkirina Rojava û ji holê rakirina Sîstema Demokratîk ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî weke yek ji qonaxên herî girîng yên pêkanîna vê armancê tê dîtin. Ji




bo vê jî teqez dixwazin Rojava dagir bikin û şoreşê tasfiye bikin.”

### ‘Şoreşa hevpar ya tevayiya gelan e‘

KCK’ê diyar kir ku çawa ku hêz û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê , DAIŞ têk birin û mirovayiyê ji tengasiyeke mezin rizgar kirin, wê li dijî dagîrkeriya faşîzma AKP-MHP’ê bisekinin û wan jî têk bibin û daxuyaniya xwe wihaqedand: “Gelê me û Gerîlayên Azadiya Kurdistanê li her derê li dijî êrîşên qirkirinê yên faşîzma AKP-MHP’ê ya Kurdan di nava têkoşîn û berxwedaneke bênavber de ye. Weke Tevgera Azadiyê ya Kurd em bang li hemû gelên cîhanê, kesimên şoreşger û demokratîk dikin ku weke duh îro jî li rex gelên Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyeyê bisekinin û Şoreşa Rojava biparêzin.”

# Rojnamevaneke Îtalî: Şoreşa 19’ê Tîrmehê hêviya mirovayiyê ye

**Rojnamevaneke Îtalî da zanîn ku dewleta Tirkan ya dagîrker û çeteyên DAIŞ’ê hewl didin bi her rê û rêbazê Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya li bakur û rojhilatê Sûriyê têk bibin û got, “Vê şoreşê hêvî da mirovayiyê tevê.”**

Di dirêjahiya 10 salên borî de gelek rojnameger, fikirzan û şandeyên dîplomasî serdana Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, da ku rewşa Şoreşa 19’ê Tîrmeha 2012’yan ji nêz ve binasin.
Ji nav wan jî rojnamegera îtalî Benedetta Argentieri ye ku gelek caran serdana Rojava, herêmên Reqa û Tebqayê kir.
Di hevpeyvînekê li gel ajansa me (ANHA) de rojnamegera îtalî Benedetta Argentieri Şoreşa 19’ê Tîrmehê di 10 salên wê de nirxand.

### `Gel xeta sisiyan hilbijart’

Têkildarî mijarê rojnameger Benedetta Argentieri anî ziman ku qonaxa yekemîn, ji 19’ê Tîrmeha 2012’yan ve dest pê kir, dema ku şêniyên Kobanê bajar ji rejîmê paqij kir û got: “Li vir eşkere bû ku Kurd tev li opozîsyonê nabin, lê xeta sêyemîn hilbijart, ew jî rêya nû ya xwerêvebirinê ye. Ji ber wê gelek rojnamegeran bi taybet rojavayan bi şik li kurdan dinêrîn.”

Benedetta Argentieri diyar kir ku şoreş kêliya avakirin û guhartina civakê bû û kêliyeke pir girîng bû. Lê piranî welatiyên li derveyî Kurdistanê nizanîn çi li wir diqewime.
Benedetta Argentieri girêdayî qonaxa duyemîn ev tişt anî ziman: “Dema DAIŞ’ê êrişî Kobanê kir, ez wê bi qonaxa duyemîn bi nav dikim. Ji ber civata navneteweyî ji wê kêliyê ve nas kir ku şoreşek li Sûriyê heye ku opozîsyonê nikarî bikira, lê Kurd wê yekê dikin.”
Her wiha Benedetta Argentieri diyar kir ku aliyê siyasî di rojnamegeriyê de derneket pêş, lê doza Kurd, partî û tevger li derveyî Rojhilata Navîn bi awayekî baş navdar bû.

### `Şoreşê hêvî da têkoşerên ji bo azadiya li cîhanê’

Der barê tiştên Şoreşa 19’ê Tîrmehê li gel kesên hewl didin azadiyê li cîhanê pêk bînin de, rojnamegera îtaîl Benedetta Argentieri ev tişt got: “Piranî kesên li cîhanê nas kir ku çi tişt diqewime. Şoreşa Rojava hêvî da ku gelek kesên çepgir û kesên li tevahî cîhanê yên ji bo azadiyê tê dikoşin.”
Benedetta Argentieri destnîşan kir ku şoreşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bandor li kesên normal jî kir û tev li komên piştgiriyê bûn û wiha pê de çû: “Ji ber tiştên ku ji Şoreşa Rojava fêr bûne êdî bûn çalakger ku rêyeke din li derveyî rejîma kapîtalîstê heye. Piranî kes ji tevaî cîhanê tev li şoreşê bûn û fêr bûn.”
Benedetta Argentieri bal kişand ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku êdî li gel piranî dewletên neteweyî naskirî ye û êdî bûye statûyek.

### `Dewleta tirkî û DAIŞ xetera mezin li ser şoreşê ne’

Rojnameger Benedetta Argentieri qonaxa sêyemîn ku niha tê jiyîn bi ya herî xeternak wesif kir û wiha got: “DAIŞ’ê di aliyê leşkerî de têk çû û rojavayî ji bilî desteka leşkerî tiştekî din pêşkêş nakin, dewleta Tirk jî hewl dide vê laboratoriya siyasî hilweşîne.”
Benedetta Argentieri wiha berdewam kir: “Bê guman dema em bi şoreşa Rojava difikirin divê nefikirin ku cihekî herî nimûne ye. Şoreş tiştekî piratîkî ye, lê gelek pirsgirêk û nakokî hene.”
Têkildarî çareserkirina wan



pirsgirêk û nakokiyan rojnameger Benedetta Argentieri ev tişt anî ziman: “Çareserkirina hin ji wan hêsan e, lê hinên din jî pêdiviya xwe bi gelek dem û kedan heye. Bê guman li gel gefên bênavber ên dewleta Tirk, çete û DAIŞ’ê zehmet e ev yek pêk bê.”
Benedetta Argentieri wiha xuya kir: “Wek min berê gotiye, şoreşa Rojava hêviyek da ku gelek kesên li cîhan û Ewropa. Ew jî tevî ku gelek kurdên li Ewropa ji ber rejîmên li Tirkiyê, Iraq, Sûriyê û Îranê neçarî wir bûne û êdî doza Kurd li gel piraniyan nas kiriye, lê Şoreşa Rojava ew yek derbas kir.”
*ANHA*

# 'Dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya gelên herêmê xeter e'

Welîd Çolî diyar kir ku armanca dagîrkeriya tirkî parçekirina xaka sûriyê ye û got, pêwîst e hikumeta şamê erkê xwe pêk bîne û li dijî dagîrkirina xaka Sûriyê helwesteke cidî nîşan bide

**Mihemed Xanim/ Qamişlo**

Bi armanca şkandina vîna gelên herêmê û têkbirina projeya Biratiya Gelan, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di nava bêdengiya cîhanê de, dagîrkerî û çeteyên wê, gefên xwe yên ser herêmê zêde dikin û ji bo qirkirina gelên herêmê bi hêzên navdewletî re di nava bazarê de ne. Di rojên dawî de, dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê, êriş û gefên xwe li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê zêde kirine.

Li ser gefên dagîrkeriya tirkî yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û civînin Tirkan bi hêzên navneteweyî re, lêkolînerê siyasî Welîd Çolî ji me re axivî.

### 'NATO ji bo berjewndiyên xwe yên li Rojhilata Navî Tirkiyê bi kar tîne'

Welîd Çolî diyar kir ku hêzên navneteweyî ji bo berjewndiyên xwe destekê didin dewleta tirkî û wiha got: "Têkiliya NATO bi Tirkiyê re li ser du qonaxan hat avakirin. Ya yekê di çarçoveya şerê sar yê di navbera hêzên Rojavayî û Yêkîtiya Sovyetan de, ku ji sa 1947'an heta 1991'ê, dewam kir. Qonaxa duduyan jî piştî têkçûna Yekîtiya Sovyetan, derketina rola Rûsya, Çîn û tevgerên Islamî li Rojhilata Navî. NATO li ser vî binghî destek da Tirkiyê. Piştî krîzên derketina krîzan li Rojhilata Navî , Asiya Navî û Rojhilatê Ewropa, Tirkiyê ji bo pêkanîna projeyên xwe yên weke Osmaniya nû û Mîsaqa Milî hin tişt bi dest xistin. Tirkiyê baweriya xwe bi erdîngariya xwe neanî. Rayedarên Tirkiyê eşkere dibêjin emê erdîngariya dewleta xwe bi aliyê Sûriye, Iraq û Yûnanistanê ve fereh bikin. Dagîrkeriya tirkî dixwaze ji nakokiyên di navbera hêzên navnetewyî de sûdê bigire. Di dema niha de jî ku şerê di navbera Rûsya û Ukrayna de xurt bûye, Tirkiyê derfet dîtiye ku siyaseta xwe bimeşîne û êrişî bakur û rojhilatê Sûriyê bike"

Çolî bal kişand ser civînên dewleta tirkî yên bi hêzên navnetewyî re yên ji bo bidesxistina erêkirina êrişên ser bakur û rojhilatê Sûriyê û wiha got: "Dewlta tirkî di civîna NATO ya li Medrîdê de, gefên xwe yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê dubare kirin û ji endamê NATO bêdengî dît. Em nikarin teqez bikin ka Tirkiyê ji bo êrişên ser herêmê ji NATO destûr girtiye yan na, lê li hemberî gefên wê bêdengî hebû. Rayedarên Tirkiyê eşkere gotin NATO gefên Tirkiyê yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê gotûpêj nekirine."

### 'Dewleta tirkî ji nakokiya di nabera Amrîka û Rûsya de sûdê digire'

Çolî da xuyakirin ku dagîrkeriya tirkî li ser nakokiya di navbera Rûsya û NATO de dilîze û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Têkiliya Tirkiyê bi Rûsya û NATO re ne li gorî asta ku her du alî dixwazin e. Tirkiye di navbera wan de li ser du benan dilîze. Ji ber wê helwesta xwe di şerê di nabera Rûsya û Ukrayna de bi rengekî zelal eşkere nekiriye. Ne piştgiriya NATO bi temamî kiriye, ne jî ya Rûsya. Derbarê Deryaya Reş de jî hin kartên zextê di dest Tirkiyê de hene û wan bi kar tîne. Di dema dagîrkirina Efrînê de, Rûsya ji bo berjewendiyên xwe piştgiriya dagîrkeriya tirkî kir. Lê Rûsya niha dixwaze tevayiya xaka Sûriyê vegerîne binê kontrola rêjima Esed û pêwêst e derftê nede Tirkiyê ku êrişî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bike. Di demên pêş de, dibe ku Rûsya bi riya bazarên siyasî derfetê bide dagîrkeriya tirkî ku êriş bike û her tişt pêkan e."



### 'Hêzên netewperest projeya Rêveberiya Xweser li ser desthilatdariya xwe xeter dibînin'

Lîkolênerê siyasî Welîd Çolî diyar kir ku ji bo têkbirina êrişên dagîrkeriyê yekîtiya gelên herêmê pêwîst e û axaftina xwe wiha qedand: "Projeyeke wekî projeya Rêveberiya Xweser ji bo tevayiya gelên Sûriyê pir girîng e. Projeyeke wisa ye ku bi rengê nenavendiya dewletê sîstema dewleta Sûriyê nîşan dike. Ew çareseriya krîza Sûriyê ye û wê bandorê li tevayiya sîstemên Rojhilata Navî bike. Ji ber wê hêzên netewperest vê projeya demokratîk li ser sîstemên xwe xeter dibînin û dixwazin têk bibin. Xetera gefên êrişa dagîrkeriya tirkî ser hermên bakur û rojhilatê Sûriyê pir mezin e. Xetera dagîrkeriya tirkî li ser tevayiya gelên herêmê ye. Pêwîst e gelên herêmê yekîtiyê xwe xurt bikin û êrişên dagîrkeriyê têk bibin."

# Lîwa Şemal El-Demokratî: Şerê me wê heta rizgarkirina herêmên dagîrkirî bidome

**Lîwa Şemal El-Demokratî diyar kir ku amade ne herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê biparêzin û got "Tu ferq di navbera ti devera xaka welatê me Sûriyê de nîne. Eger dagîrkeriya tirk êrişî herêmê bike, wê şerekî giştî û dirêj dest pê bike. Ev şer ji Serê Kaniyê heta bi Idlibê neyê rizgarkirin, wê raneweste."**

FacebookTwitterWhatsAppTelegram

Bi beşdariya Fermandariya Lîwa Şemal El-Demorkatî, şervanan toraneke leşkerî li dar xist. Piştre ji fermandarên Lîwa Şemal El-Demokratî Ebû Omer El-Idlibî daxuyanî xwend.

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku dewleta Tirk gefan li dijî herêmê dixwe û pê re hikumeta Erdogan hewl dide bi hincetan bêbingeh û derew, xaka Sûriyê dagir bike û wiha dewam kir: "Li ser bingeha parastina rewa em ê wekî hêzên Lîwa Şemal El-Demokratî parastina bajar û gelê xwe bikin.



Tu ferq di navbera xaka welat Sûriyê de tune ye. Em parastina rojhilatê Firatê wekî parastina Idlibê dihesibînin ku bajarê me ye û ji aliyê rêxistinên terorîst ên dewleta Tirk a dagirker ve hatiye dagirkirin."

Di berdewamiya daxuyaniyê de soz ji bo gel û şehîdan hat dayîn ku dê di lehengî û fedekariyê de dersekê bibin dijmin û hate gotin: "Em ê şerekî dirêj û giştî bidin destpêkirin. Ev şer heta ku xaka Sûriyê ya dagirkirî ji Serêkaniyê û heta Idlibê neyê rizgarkirin, dê raneweste. Em ê hewldanên dagirkeriya Tirk têk bibin û bi fedekariyên şervanên me, xweragirtina gelê me, doza me ya ail û têkoşîna me ya pîroz dê dîrok mezintirîn şerên rûmetê binivîse."

Di dawiya daxuyaniyê de soza parastina xak û gelê herêmê ji êrişan hate dayîn û berxwedana gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku piştgiriyê didin têkoşîna wan a rewa û hêzên li eniyên şer parastina welat dikin, hate silavkirin.

***ANHA***



## Divê salvegera dehan bibe salvegera parastina nirxan

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirkan ya dagîrker ku beşek ji xaka Sûriyê dagîr kiriye rojane gund û navçeyên herêmên sînor topbaran dike. Rojane welatiyên wan herêman dikuje, dide koçberkirin û malên wan talan dike. Di demeke wisa de Serokê Dewleta Tirkan Erdgoan gefa êrişeke dagîrkeriyê ya nû li dijî herêmê dixwe. Ev jî metirsiyê li ser ewleyiya tevayiya herêmê çêdike. Li aliyekî ewleyiya bi milyonan kesên li herêmê ku jimareke mezin ji wan koçber in, dixe metirsiyê, li aliyê din jî têkoşîna li dijî DAIŞ'ê ku QSD'ê bi hevkariya Koalisyona Navdewletî dimeşîne, asteng dike. Herwiha bi êrişa muhtemel re, derfeta zindîbûna DAŞ'ê careke din zêde dibe. Amerîka di vê derbarê de daxuyanî dan û got êrişa muhtemel li dijî herêmê wê têkoşîna li dijî DAIŞ'ê asteng bike. Fermandarê Giştî yê QSD'ê Mezlûm Ebdê daxuyanî derbarê mijarê de da û diyar kir ku wê bi tevayiya hêza xwe parastina herêmê bikin û bersiva êrişan bidin. Li aliyê din jî berî wê Rêveberiya Xweser rewşa awerte ragihand.

Li aliyê din jî 33 partiyên siyasî yên bakur û rojhilatê Sûriyê berî demekê bi daxuyaniyekê bang li civaka navneteweyî û di serî de NY herêmên kir ku bakur û rojhilatê Sûriyê ji balafirên şer û yên bêmirov re qedexe bikin. Partiyan di heman çarçoveyê de peyamek radestî bûroya NY ya li Qamişlo kir.

Lê heta niha NY û hêzên mezin yên di rewşa li Sûriyê de xwedîbandor roleke erênî ji bo rawestendina êrişan pêk nelîstine, helwesta wan di asta daxuyaniyan de maye. Ev jî metirsiya êrişan zêdetir dike. Ji lewma di rewşeke wiha de ji tevayiya xelkên bakur û rojhilatê Sûriyê tê xwestin ku ji bo parastina herêmê di nava amedekariyê de bin, xwe di her awayî de li gorî rewşa berxwedanê amade bikin.

Careke din jî ji xelkên bakur û rojhilatê Sûriyê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî yê li hundi û derveyî welat dijîn, tê xwestin ku ji bo pêkanîna biryareke navdewletî ya qedexeya balafiran li ser herêmê bi tevayiya hêza xwe têkoşînê bikin. Di heman demê de ji gelê Kurd û dostên wan tê xwestin ku ji bo parastina destkeftiyên şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê ku niha di salvegera wê ya 10'an de tê pêşwazîkirin, tê xwestin vê bikin rojeva her kesî.

Ev çi di riya malperên dijîtal û heştagên ji aliyê Meclisa Medya Dicîtal tê ragihandin, çi di riya dost û hogirên heyî yên li her çar aliyên cîhanê dikare bibe. Ji ber ragihandina qedexeya rabûna balafiran wê gelekî bandorê li dewleta Tirkan ya hêza xwe dispêre teknîka hewayî bike.

Bêguman wisa jî wê dewleta Tirkan û komên xwe yên çete bi ti awayî nikaribin li ser erdê ti gavan biavêjin, heger êrişeke bê balafir kirin jî ne pêkan e encamê bi dest bixin.

Ji bo wê jî di salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê de erkê her kesî ye ji bo parastina bakur û rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser ya ji bo çareseriya aloziya tevayiya Sûriyê bûye, mînak, zêdetir di nava têkoşîn û xebatan de bin. Her çendî civaka navdewletî ji bo berjewendiyan her tiştî dike, gerek em di çi astê de be jî, em karibin bandorê li wan bikin û rastiya wan li nava çavên wan bixin.



# Foza Yûsiv: Hêza me heye, em pişta xwe bi hêzên garantor xurt nakin

Endama Desteya Serokatiya PYD`ê: Divê em ji dîrokê fêr bibin û waneyan derxin û xwe nexapînin; Rûsya û Amerîka ji bo berjewendiyên xwe li vir in û emê xwe nespêrin wan. Hêza me, hêza hevgirtin û xweparastina gelên herêmê ye.

**Xalid Etê/Qamişlo**

Têkildarî gef û êrişên dawî yên dewleta tirkî, helwesta hêzên garantor li bakur û rojhilatê Sûriyê û helwesta gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, rojnameya me bi Endama Desteya Serokatiya PYD`ê Foza Yûsiv re hevdîtin pêk anî.

**Hevdîtin wiha ye:**

**Gef û êrişên dewleta tirkî vê dema dawî dijwartir bûne, hûn armanca wê çawa dinirxînin?**

Dewleta tirkî dixwaze polîtîkayên ku sedsala 20`an kirine, dîsa vegerîne. Armanca wê ew e ku Kurd nebin xwedîmaf. Herwiha dixwaze herêmên din ji Sûriyê dagîr bike. Erdogan dixwaze sînorê Mîsaqa Milî vegerîne. Ev tê wateya ku plana Tirkî ser tevayiya Rojhilata Navî xetereke mezin e. Di vê pêvajoyê de jî Tirkiye dixwaze ji geşedanên ku li Ukrayna hene sûdê bigire û dîsa êrîşekê pêk bîne. Herwiha îro Tirkiye bi serkêşiya Erdogan di nava aloziyeke mezin de ye, ew dixwaze aloziya xwe bi dagîkeriyê veşêre û xwe wek serkeftî nîşan bide da ku di hilbijartinên Tirkiyê de qezenc bike.

**Gelo di vê projeyê de Kurd tenê amanc in?**

Bi zanebûn propagandaya wiha dikin. Lê di rastiyê de Erdogan dixwaze xwe wek Ataturkê duduyan ragihîne û beje min erdê Tirkiyê fireh kiriye. Ji ber wê çavê xwe berdide tevayiya erdê Sûrî û Iraqê. Armanc ew e ku ji Heleb heta Kerkûkê dagîr bikin. Herwiha Rêvebiriya Xweser jî têk bibin û bi serkeftineke sexte derbasî sala 2023`yan bibe. Ji ber wê pir eşkere ye ku daxwaziya Erdogan ne ji bo Kurdan tenê, ji bo Ereb û Suryanan jî xeter e. Ew naxwaze aramî çêbe û demokrasî pêş bikeve. Ew hebûna xwe li ser qirkirin û kuştinê ava dike. Çawa ku Komara Tirkiyê li ser komkujiya Ermen, Suryan û Kurdan ava bûye, niha jî dixwazin sedsaliya komara xwe bi dagîrkerî û qirkirina tevayiya gelan û erdê Mezepotamya biparêze. Pêwîst e hem Iraq hem Sûriye vê xeterê baş bibînin û li gorî wê siyasetê bikin û xwedîhelwest bin.

**We behsa xetereke mezin li ser Sûriye û Iraqê kir, gelo li hemberî vê rewşê hûn helwesta Şamê çawa dinirxînin?**

Hikumeta Şamê di dema derbasbûyî de îrade nişan neda û bi wêrekî tev negeriya. Eger bi Rêveberiya Xweser û QSD`ê re hevkarî bikra meyê bi hêza xwe ya xweser bikariya dagîkeriya tirkî têk bibin. Lê mixabin siyaseteke gelek teng û bêaso da meşandın. Divê mirov ji dîrokê waneyan derxe. Çawa Tirkiyê Liwaya İskenderûnê dagîr kir û li şûna şêniyên wê yên Ereb, Tirk bi cî kirin, niha jî heman tiştî dike. Divê Hikûmeta Şamê xwedîhelwest be. Li kêleka Rêveberiya Xweser be. Divê em nakokiyan bidin kêlekê. Îro yekîtiya Sûriyê di xeterê de ye. Divê em mezin bifikirin ji bo mezin wenda nekin. Eger em gelên Suriyê bibin yek, emê dewleta Tirkî têk bibin. Tersî wê emê hemû wenda bikin. Ji ber wê banga me ew e ku hikumeta şamê guhertinê di siyaseta xwe de çêke û helwsteke li dijî dagîkeriyê nişan bide.

**Li bakur û rojhilatê Sûriyê du hêzên garantor hene, gelo hûn helwesta wan çawa dinirxînin?**

Rusya û Amerîka li gorî berjewendiyên xwe tev digerin. Ji bo wan em bên kuştin yan qirkirin ne girîng e. Ew karin me hemûyan bikin qurban ji bo berjewendiyên xwe. Rewşa Ukrayna û Efxanistanê vê teqez dike. Divê em waneyan derxin û xwe nexapînin. Divê em baweriya xwe bi garantiya wan jî neynin. Divê em xwe bispêrin hêza xwe û berxwedana xwe bikin bingeh, em xwediyên vê axê ne. Divê çavê me ne li kesî be ku werin me biprarêzin. Erkê me ye ku em xwe biparêzin. Îro cîhan hemû xwe bi çek dike. Divê em jî xwe ji her gengaziyê re amade bin. Dewletên mezin durû ne û bawerî bi wan nayê. Divê ev rastî baş fêm bibe û li gorî wê tev bigerin

**Li dijî êrişên dagîrkeriyê pêwîst e helwesta gel çawa be?**





Em şer naxwazin lê ji bo ku em xwe ji şer biparêzin divê em xwe baş amade bikin. Gotinek heye dibêjin, ji bo ku kes cesaret neke êrîşî te bike divê tu pergla xwe ya parastin xurt bikî. Dibêjin parastina herî baş êriş e. Raste eger xwe bê parastin bihêlin emê cesaretê bidin dijmin. Divê em xwe bi çek bikin her kes bibe endamê HPC`ê, xweparastin erkê her mirovî ye. Divê em parastina xwe nespêrin kesî. Civaka ku xwe biparêze dikare azad bijî. Azdiya bêparastin bêgarantî ye û herdem di xetera hebûn û tinebûnê de ye. Ji ber wê divê jin, mêr, ciwan xwe amade bikin em bi hêzên parastinê re milbimil axa xwe û rûmeta xwe biparêzin.

## Em şoreşa Rojava bidin jiyandin

**Zekî BEDRAN**



Şoreşa Rojava salvegera xwe ya 10. pîroz dike. Deh sal bi şer, serûbinbûn, dorpêç û tevgerên dagîrkeriyê re derbas bûn. Şer û şoreş di nava hev de dewam dikin. Şoreşa Rojava bi geşedanên li Rojhilata Navî re derket holê. Li aliyekî serhildanên gel ku dibêjin 'Bihara Ereban', li aliyekî din derketina DAIŞ'ê ku êrişî mirovayiyê kir, hevsengî hejandin. Navenda vê hej û şer derbasî Sûriyê bû. Hêzên bibandor yên dinyayê tev tevlî van nakokî û şeran -ku bi Şerê Dinyayê yê 3. tê pênasekirin- bûn. Di nava van nakokî û şeran de şoreşa Rojava derket meydanê.

Ji bo fetisandina şoreşa Rojava Tirkiyê serî li her xirabiyê da. Berê DAIŞ'ê da Kobanê, bi ser Kurdan de şand. Bi DAIŞ'ê, El Qaîde û tevayiya çeteyên din re itîfaq kir. Sûriye xist nava gerîneka şerekî bixwîn. Sînorê xwe ji çeteyan re vekir, biçek kirin û berê wan da ser Sûriyê. Bi milyonan mirov kişandin Tirkiyê. Hem kirin şervan, hem li hemberî Ewropa bi kar anîn, hem bi awayekî erzan kirin xizmeta aboriya xwe. Di vî şerê bixwîn de Kurdan bê ku xwe bispêrin hêzeke din li hemberî DAIŞ'ê şer kir. Artêşa Sûriye û Iraqû nikariyan şer bikin. Navendên weke Mûsil û Reqa ketin destê DAIŞ'ê. Çekên van artêşan xistin destê xwe. Lê berxwedana Kurdan hem li Sûriyê hem li Iraq û Rojhilata Navî rewş guhert. Koalisyonê bi hêzên Rojava re hevkarî kir û di dawiyê de DAIŞ şkandin.

Şkandina DAIŞ'ê ji bo mirovayiyê serkeftineke mezin bû. Lewra ji bo dinyayê tevê xeter bû. Ji bo wê şoreşa Rojava hê di derketina xwe de bi mirovayiyê re bû yek û taybetiyeke navneteweyî bi dest xist. Ji gelek deverên dinyayê gelek mirov hetin tevlî şer û şoreşê bûn.

Şoreşa Rojava ne DAIŞ tenê bin xist. Di heman demê de ji bo seranserê Rojhilata Navî bi naverokeke demokratîk ku weke av û hewayê lazim e dest pê kir û wisa pêş ket. Wekhevî, demokrasî û azadî bûn taybetiyên wê yên bingehî. Ji bo bihevrejiyana gel, çand û baweriyan bû mînak. Jin ne tevlî berxwedan û şeroşê tenê bûn. Bûn hêmana bingehî û pêşengên şoreşê û pêş ketin. Di qada leşkerî, siyasî û civakî de û di her qadê de di asta pêşengiyê de cî girtin. Şoreşa Rojava bi şoreşa jinan hat naskirin û pênasekirin. Ji bo wê bûn mînaka yekê ya dinyayê.

Şoreşa Rojava li hemberî DAIŞ'ê şer ber bi Minbic, Reqqa û Dêrazorê ve fireh kir û yekîtiya Kurd û Ereban pêk anî. Xwîna gelan tevlî hev bû û şoreş bû berhema hevbeş ya gelan. Gelên li Sûriyê dijîn yên wek Asurî-Suryanî, Erman û yên din tev li hev xwedî derketin. Siyaseta Tirkan ya şkandina Kurda û Ereban bi hev heta îro jî bi ser neketiye. Rêveberiya Şamê jî xebitî miliyetgiriyê zindî bihêle. Lê ya bi ser ketî bû şoreş û îradeya hevbeş ya gelan. Li herêmên hatîn rizgarkirin rêveberiyên xweser çêbûn û gel xwe bi rê ve bir.

Dewleta tirkî dijminiya herêmên xweser bi taybetî ya Rojava kir. Ji bo wê bi lihevkirina bi Rûsya re Çileya 2018an Efrîn dagîr kir. Bi lihevhatina bi Amerîka re Cotmeha 2019an Serê Kaniyê û Girê Spî dagîr kirin. Kurdên li wan herêman ji ciyên wan derxistin. Malbatên çeteyan li ciyê wan bi cî kirin. Li hemberî Kurdan dest bi qirkirinê kir. Li NY ji Efrînê heta Dêrikê heta 30 km kir wek 'herêma ewle' ragihand û got emê dagîr bikin. Cewherê planê qirkirna Kurdan e. Wê Kurd ji ciyê wan bên derxistin li şûna wan kesin din bi cî bikin.

Dewleta tirkî niha jî planên nû yên dagîrkeriyê ragihandine. Ji bo wê bi Îran û Rûsya ra bazarê dike. Rêveberiya Şamê jî dev ji rêbaza rêveberiya desthilatdarî û navendî bernade. Xwe nêzîk nake ku bi hrêmên xweser re gefên Tirkan bi dawî bike. Dewleta tirkî amadekariyê dike ku herêmên dagîrkirî bi ser welatê xwe ve bike. Çawa ku tê dîtin nirxên demokratîk yên gelen yên bi berdêlên giran hatîn bidestxistin tev di metirsiyê de ne. Ewlekariya qada hewayî ya Sûriyê di destê Amerîka û Rûsya de ye. Yek ji van hêzan jî ne xwediya helwesteke cidî ye. Xwediyên şoreşê gelên Sûriyê ne. Ji bo wê divê di serî de gelên bakur û rojhilatê Sûriyê hêzên demokratîk yên dinyayê